

Hûn forma “Rezamendiya Dayîna Agahiyên Ferdî bo Kesên Din” (MR049) bi kar tînin ku destûrê bidin IHMS’ê agahiyên we yên ferdî yên heyî (agahiyên hestiar û tenduristiyê jî) wekî ku li gorî Peymana Nihênîyên Ferdî ya Avûstraliyayê ya sala 1988’an rave bûye, bide Sazî/Nûnertiyên ku we navên wan li jêrê diyar kirine. Ew ê derfetê bide we ku destûrê bidin IHMS’ê tomarên agahiyên ferdî yên pêşerojê jî eşkere bike.

Hûn bi dayîna rezamendiyê divê bizanin ev agahiyên ferdî dê ji aliyê Sazî yan Nûnertiyên ku destê wan bigihîje çawan werin bikaranîn, ew Sazî yan Nûnertî dixwaze çiqasî Agahiyên we yên Ferdî xwedî bike û ew ê çî ewlekariyan ser wan bike. Herwiha, hûn divê xwe ji metirsiyên dayîna Agahiyên xwe yên Ferdî (agahiyên hestiar jî) beşên din agahdar bin. Ev wekî agahdarbûn tê naskirin û rezamendiya ku hûn didin ê “rezamendiya agahdarane” be. Pêwîst e IHMS ewle be ku dema hûn rezamendiyê didin, hûn rezamendiya agahdarane bidin. IHMS bi dayîna şîretan bo we sa agahdarbûna ji bikaranîn û metirsiyên eşkerekirina Agahiyên we yên Ferdî bi destê IHMS’ê ji Sazî yan Nûnertiya we ya diyarbûyî, dê wisa bizane ku rezamendiya we ya dayî di Forma Rezamendiyê da wekî rezamendiya agahdarane be.

Herwiha pêwîst e ku em bi bîr binin hûn dikarin her demê bi şandina agahdarnameya nivîskî bo IHMS’ê rezamendiya xwe betal yan sererast bikin.

Ji kerema xwe, ewle bin ku we Forma Rezamendiyê bi baldarî xwendibe. Eger bo têgihîştina pêdiviyên pêwîstiya we bi arîkariyê hebe, ji kerema xwe ji IHMS’ê bipirsin. Piştî ku we rezamendiya xwe wajo kir, bila kopiyêke wê ya wajokirî bo lîsteyê pêşerojê li bal we bimîne.

IHMS dê di diyarkirina eşkerekirina Agahiyên we yên Ferdî wisan bike ku li gorî qanûnê û Peymana Nihênîyên Ferdî ya Avûstraliyayê be.

Beş	Rênişan <i>(Ji kerema xwe bizanin ku eger hûn li gorî rênişana jêrê nebin, wê demê ev dikare bibe sebeb IHMS heya ku form durist tîjî nebe, forma rezamendiya we red bike)</i>
Kesê/a Rezamendiyê Dide	Hemî xane divê bi alfabe, hejmar û pergal û formeta a rojan a inglîsî û her dera pêwîst tenê bi tîpên mezin tîjî bibin.
Rezamendiya Dayîkbavan/Serperestê/a qanûnî	Zarokên jêr 16 salî divê rezamendiya izna dayîkbav yan serperestê/a qanûnî ya dewletê erê kiribin bo eşkerekirina agahiyên ferdî yên zarokê hebin.  Zarokên 16 salî û zêdetir heya 18 salî divê rezamendiya xwe amade bikin meger ku belgeyêke klînîkî hebe û nîşan bide şiyana zarokê ya dayîna rezamendiyê tune. Dayîkbav yan serperestekî/a qanûnî tenê dikare izna eşkerekirina agahiyên ferdî yên vî emr û temenî wê hingê bide ku zarok bi nivîskî rabigihîne ku dayîkbavê yan rayedarê/a qanûnî rezamendiyê bide IHMS’ê.  Kesê/a ji 16 salî hevraztir ku bijîşkekî/a xwedan şert û merc bibêje şiyana wî/wê ya dayîna rezamendiya agahane tune. Kesê/a ji 16 salî hevraztir ku bijîşkekî/a xwedan şert û merc bibêje şiyana wî/wê ya dayîna rezamendiya agahane tune. Eger hûn hez dikin agahiyên we yên ferdî bo du yan çend sazî yan nûnertiyan eşkere bibin, wê demê pêwîst e formên rezamendiyê yên cuda bo her yekê û her sazî û/yan nûnertiyê tîjî bikin.  Serperestê dozvekirinê tenê dikare izna eşkerekirina agahiyên ferdî bo wê armanca dozê bide ku destûra wê bo serperestiyê hatiye dayîn.
Rezamendî	<b>Sazî/Nûnertî</b> Tenê saziyek yan nûnertiyek dikare di forma rezamendiyê da destnîşan bibe. Eger dudu yan zêdetir diyar bibin, IHMS dê tenê yekê wekî sazî yan nûnertiya yekem a li lîsteyê bibîne. Eger hûn hez dikin agahiyên we yên ferdî bo du yan çend sazî yan nûnertiyan eşkere bibin, wê demê pêwîst e formên rezamendiyê yên cuda bo her yekê û her sazî û/yan nûnertiyê tîjî bikin.  <b>Agahiyên Taybet ên Ferdî ku IHMS eşkere dike</b> Hûn divê bi zelalî lê bi kurtasî diyar bikin iznê didin IHMS dikare kîjan agahiyên we bo sazî yan nûnertiyên diyarbûyî eşkere bike. Wek mînak, “hemû jiyana dermanî”, “yên li bara birîndariya destan”, “serboriya tenduristiyê derûnî”, û hwd.  <b>Agahiyên ferdî yên pêşerojê</b> Forma rezamendiyê heya roja rezamendî hatiye dayîn (agahiyên ferdî yên heyî jî dihewîne) bi itibar e. Eger hûn hez dikin serboriyên we yên pêşerojê (yanê, Agahiyên we yên Ferdî ku IHMS’ê piştî roja rezamendiyê berhev kiriye) bo Sazî yan Nûnertiya diyarbûyî li ber dest be, hûn divê li Forma Rezamendiyê cihê diyarbûyî bo “Agahiyên Ferdî yên pêşerojê” wajo bikin. Eger li wî cihî wajo tunebe, wê demê IHMS dê wiha bizane ev yanê hûn rezamendiyê bo eşkerekirina serboriyên pêşerojê nadin.
Nirxandina IHMS’ê ji Wajoyê	Hûn divê ewle bin ku dema hûn dil hene Forma Rezamendiyê tîjî bikin, li bal bijîşkekî wajo bikin ku IHMS wî/wê erê dike (ew dikare bijîşkê tenduristiyê li klînîkeke tenduristiyê yê IHMS’ê be eger hûn li cihê girtinê yê koçberan yan Navendeke Nirxandinê ya Navçeyî dimînin yan jî bijîşkekî tenduristiyê yê ku IHMS’ê diyar kiriye wekî pêkhînerê tenduristiyê civaka we be ku eger hûn li wê civakê dimînin (ew ê bijîşkê giştî be ku IHMS’ê bo we diyar kiriye eger hûn li Binçavbûna Civakê li Avûstraliyayê dimînin yan bijîşkê tenduristiyê li Klînîka Cîwarbûnê ya Nauru’yê yan Navenda Veguhestinê ya Lorengau’ a rojhilatî li girava Manus’ê be). Eger hûn li civaka Avûstraliyayê bi vîze dimînin, wê demê hûn divê Forma Rezamendiyê bi kar neyînin, li şûna vê, daxwaza dest gihîştina rasterast bo Wezareta Koçberiyê û Parastina Sînoran li gorî <i>Peymana Azadiya Agahiyên a Avûstraliyayê</i> bikin.

**KESE/A REZAMENDIYÊ DIDE ("KES")**  
(ev beş divê were tijîkirin)

Nav:	Hejmara nasîne:	
<input type="checkbox"/> Mêr <input type="checkbox"/> Jin	Rojbûn: _____ / _____ / _____	Temen:
Ziman:	Wergêrê devkî bi kar anîn: <input type="checkbox"/> Erê <input type="checkbox"/> Na	Hejmara wergêrê devkî:

**REZAMENDIYA DAYÎKBAV/SERPERESTÊ/A QANÛNÎ**

(tenê eger kes nikare rezamendiyê bide, were tijîkirin: eger kes dikare rezamendiyê bide, ev beş vala bimîne)

Nav:	
Rojbûn:	Pêwendiya bi kes ra:

**BALDARIYA ITIBARA REZAMENDIYÊ Û MAFÊ BETALKIRINÊ**

Ez bi wajokirina vê formê dipejirînim ku rezamendiya min a li vir dê xwedan itibar bimîne heya ku ez betal bikim yan pênc salan piştî roja ku min ev rezamendî daye (her kîjan zûtir be). Ez têdîgihêjim ku ez dikarim vê rezamendiyê her demê bi agahdarnameyeke nivîskî bo Xizmetên Dermanî û Tenduristî yê Navneteweyî Pty Kêmsinor (IHMS) betal yan sererast bikim.

**REZAMENDÎ**

(hemû xaneyên jêrê divê werin tijîkirin)

IHMS, şaxeyên wê jî, ji vir û pê va dikarin û agahdar in ku Agahiyên min ên Ferdî yê niha (agahiyên hestiyar yê li bal IHMS'ê jî) wekî li gorî saziya navborî yan nûnertiya min (li jêrê diyar bûye) eşkere bike:

<b>Sazî/Nûnertî</b> (Tenê navê Saziyek yan Nûnertiyekê dikare were nivîsin: Divê bo her Sazî û/yan Nûnertiya diyarbûyî formên cuda hebin)	<b>Agahiyên Taybet ên Ferdî ku IHMS eşkere bike</b>
<b>Wajoya Kes</b> (yan Dayîkbav/Serperest eger Kes nikaribe rezamendiyê bide)	<b>Roja Rezamendiyê:</b>

IHMS, şaxeyên wê jî, ji vir û pê va dikarin û agahdar in ku Agahiyên min ên Ferdî yê pêşerojê (agahiyên hestiyar yê li bal IHMS'ê jî) wekî li gorî saziya navborî yan nûnertiya min (li jorê diyar bûye) eşkere bike:

<b>Wajoya Kes</b> (yan Dayîkbav/Serperest eger Kes nikaribe rezamendiyê bide) (eger serboriyên <u>pêşerojê</u> dê ji aliyê IHMS'ê va eşkere nebin, bila xaneyên wajo û rojê vala bimînin)	<b>Roja Rezamendiyê:</b>
--	--------------------------

**Rezamendiya devkî (Tenê Karmendên IHMS'ê vêya bi kar binin** – rezamendiya devkî wê demê ye ku rezamendiya nivîskî nikare were wergirtin: *Eger rezamendiya devkî nikare were wergirtin, bila xaneyên wajo û rojê vala bimînin*):  
Min bi KES ra qala eşkerekirinê pêşniyarbûyî kiriyê. Ez xweşal im ku Kes eşkerekirinê pêşniyarbûyî fêm dike û rezamendiya xwe bo van nişan daye.

<b>Wajoya Bijîşkê Giştî yê IHMS'ê:</b>	<b>Navê Bijîşkê Giştî yê IHMS'ê:</b>	<b>Roj:</b>
--	--------------------------------------	-------------

**NIRXANDINA IHMS'Ê JI WAJOYA KES**

(yan Dayîkbav/Serperestê Qanûnî eger Kes nikaribe rezamendiyê bide)

Ez wekî bijîşkekî/a giştî ya erêbûyî li bal IHMS'ê piştrast dikim kesî/a ku wajoya wî/wê li beşa Rezamendiyê li jorê tê ditin wajoya wî/wê Kesî/ê ye ku ev Forma Rezamendiyê îşare dike (yan, li şûna wê, Kes nikare rezamendiya agahane bide û wajo ya Dayîkbav yan Serperestî/a Qanûnî yî/ya Kes e).

<b>Wajoya Bijîşkê Giştî yê IHMS'ê:</b>	<b>Navê Bijîşkê Giştî yê IHMS'ê:</b>	<b>Roj:</b>
--	--------------------------------------	-------------